Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1029 | 8-Çile- 2023 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com ☎ 423165

# 12 suwariyên Merîvanê kî bûn?

**Behroz Hisên di kurteçîrokekê de qala 12 suwariyên Merîwanê dike û diyar dike ku di salên 1720 û 1730'an de bi awayek xwezayî berazên kovî zêde dibin û çiyayan xwe ber didin û dexil û danê cotyaran dixwin, lewma Ehmed Xanê Baban 12 kesan ji bo parastinê di nava gel de hildibêje.**

**Nivîskar Behroz Hisên wiha qala 12 suwariyên Merîwanê dike:**

Ev bûyer di serdema Sefewiyan de rû daye, di salên 1720 û 1730'an de herêm di bin destê Ehmed Xanê Baban de bû. Di wê serdemê de (Beraz) kovî bi awayek xwezayî zêde dibin, ji çiya xwe ber-



didin û dexil û danê cotyaran dixwin, xelk ji ber gelek bifikar û bêzar dibin. Ehmed Xanê Baban, hejmarek kesên şaraza û wêrek ji bo nêçîrê kom dike, heta ku biçin berazan nêçîr bikin û cotyaran ji destê berazan rizgar bikin.

**Ew suwariyê jêhatî yên Ehmed Xanê Baban hilbijarî evin,**

Ciwamêr Axayê Rengên
Axal Axayê Sîweylî
Zeynel Begê Mesref
Dara Axayê Mîredê
Feramerizî Zengene
Siwar Axayê Bilbas
Mehmed Axayê Mîrawdelî
Şapur Axayê Bextiyarî
Zulal Axayê Mergey
Mîran Begê weke Begê Hemewend
Selîm Beg
Mehmûd Begê Qedîmî Başçaweşî

**Suwariyên jêhatî ji deşta Şarezorê heta Merîwanê dest bi nêçîra berazan kirin û kuştin.**

Di dema nêçîrê de, suwarî agahiya ku "Sefewiyan êriş kirine ser herêma Merîwanê" dibihîsin û niyata wan heye piştî êrişa li ser Merîwanê, êriş bikin li ser herêma Şarezûrê jî heye.

Suwariyên jêhatî xwe amade dikin, heta ku li hemberî Sefewiyan rabin ku li ser xaka Kurdistanê û xaka bav û bapirên wan dijmekî gelek tirsanek bû, lewma 12 suwariyan biryar da ku şev êriş bikin li ser Sefewiyan, ne roj.
Piştî hewldan û têkoşînek zêde, suwarî bûn 4 grûb û xwe digihînin Merîwanê, bi lêdana duholê êriş dikin li ser Sefewiyan.

**Piştî şerek mezin suwariyên jêhatî yên Kurdan li hemberî Sefewiyan ser dikevin.**


Herwiha di wê demê de artêşa Osmaniyan li hemberî Sefewiyan şikestîbû û ji herêmê reviya bû.
Herwiha di wê sibehê de, artêşa Babaniyan, ji Qelaçiwalane xwe digihîne herêma Merîwanê ku li hemberî Sefewiyan derkeve, lê dibînin ku şer b dawî bûye û dijmin reviya ye. Artêşa Babaniyan û suwariyên jêhatî bi govend û dîlanê kêfxweşiya xwe tînin ziman. Herwiha ji aliyê Ehmed Xanê Baban ve hemû suwarî tên xelat kirin.
Tişta ku di vî şerî de bala her kesê kêşa ew bû ku ji derveyî birîndarbûna Selîm Beg, ziyan li ti kes û cengawerek din ê Kurd nebû.
Bi vî awayî nasnameye 12 suwariyên Merîvan li wan hate kirin. Çîroka van 12 suwariyên Kurd di dîroka gelê Kurd heta niha zindî maye. Weke 12 suwariyên Merîwan, weke cengawerên Kurd û leheng di beyt, destan, heyranok, lawik û çîrokên Kurdistanê de cihê xwe girtine û qala jêhatî û berxwedana wan tê kirin. Herwiha li dibistan, çand û dîroka neteweya Kurdan de tê qal kirin. Heta niha jî Kurd bi şanazî qala vê çîrokê dikin.
Ew kesên fedakar, dilsoz û parazvanên welatê xwe ne. Xwedî îradeyek mezin in. Êdî ev 12 suwarî dibin sembol. Heta roja me ya îro jî ji hêla çandî ve 12 suwariya Merîwan hene. Pir komên ku çêbûne ev nav li xwe kirine. -***ROJNEWS***

# Hûn sefîrên me ne!

André Hébert yek ji înternasyonalîstên Fransî ye, ku tevî hêzên YPG´ê li dijî DAIŞ'ê şer kirin. Gava ku Reqa tê rizgarkirin û li Fransayê vedigere, şervanên YPG´ê dibêjin, tenê rastiyê ji xelkê Fransayê re bibêje, ev piştgirî wê besî me be. Ji bo ku vê rastiyê ji xelkê Fransayê re bibêje wî jî rabû serpêhatiya xwe kire Xêzeroman. Xêzeroman bi navê "Jusqu'à Raqqa: Avec les Kurdes contre Daech (Heta bi Reqayê: Tevî Kurdan li dijî DAIŞ´ê)" nivîsand. Wî sala 2019´an ji xwe kitêbeke bi heman navî nivîsandibû û hêvî dike bi xêzeromanê xwe bigihîne ciwanan. Ew ji kanala televizyonê ARTE´yê re li ser xêzeromanê peyivî, tevî xêzker Nicolas Ottero behsa pêvajoya nivîsandin û xêzkirina romanê kir.
Xêzeromana Hébert bi rexneyên baş hat pêşwazîkirin û kitêba wî ya bi heman navî jî ji sala 2019´an ve dibe mijara nûçe û rexneyên cihê yên baş. Sedem jî di hemû rexneyan de diyar e: Kite bi kite behsa rastiyê kiriye. Yanî tişta ku Kurdên Rojava jê xwestiye, ew hewl dide bi kitêba xwe û niha jî bi vê xêzeromanê bike.
André Hébert sala 2015´an diçe û tevli nav refên YPG´ê dibe ji bo ku şerê DAIŞ´ê bike. Xêzeromana wî weke rojnivîseke vî şerê li dijî DAIŞ´ê be jî, esas ew hinekî xwedî aliyekî weke manîfestoya siyasî ye jî. Nivîskar ji bo xwe dibêje, "Ez xwe weke aktîvîstekî şoreşger, înternasyonalîst, marksîst, piştgirê doza Kurdan îfade dikim."
Tevî André Hébert qederê 30 înternasyonalîstên din ên ji Fransayê hebûn. Gava André Hébert carekê vegeriyaye Fransayê, ajanên Istîxbarata Navxwe ya Fransayê DGSI´yê ew li mala wî girtine. Lê ew israr dike û dikare careke din biçe Rojava û di şerê li dijî DAIŞ´ê de yê ji bo rizgarkirina Reqayê de cihê xwe bigire.

**Hestên André Hébert kirin xêz**

Xêzker Nicolas Otero dibêje, wî hewl daye hestên André Hébert xêz bike, nexasim jî yên dema şer: Rawestana dijwar a dirêj, hişkî û rageşiya ruhî ya dema li kozik û bereyan, şerên kozikan, kêliyên



dudiliyê û piştrastbûna ji heqbûna doz û şerê li dijî DAIŞ´ê. Ew dibêje, "Min xwest tehlûke, hewar û gefa wê kêliyê hîs bikim. Min xwest ew kêliyên hizirîna xwe bi xwe yên li cihê şerî, çi aciziya westê û çi jî tehlûkeya şervanek hest pê dike, nîşan bidim. Lê her wiha min dixwest serpêhatiya ferdî ya nivîskarî jî xêz bikim."
Gava ku André Hébert û şervanên înternasyonalîst vedigerin welatên xwe, hevrêyên wan yên Kurd ji wan re dibêjin, "Hûn êdî sefîrên me ne. Behsa wan tiştan bikin, yên ku we dîtine. Rastî bes e ji bo vê yekê. Min ev di kitêbekê de nivîsîn. Xêzeroman jî dewama vê şahidiya min e. Ez hêvî dikim xwe pê bigihînim xwînerên ciwan, ên ku kêmtir siyasî bûne." -***Ozgurpolitika***

Sudoku:Pirs 39

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | | | 3 | 7 | | |
| | | 7 | 1 | | 6 | 8 | 9 | |
| 6 | 2 | 3 | | 9 | 7 | | | |
| | | | | | | | 8 | 4 |
| | 7 | | | | | | 2 | |
| 8 | 5 | | | | | | | |
| | | | 3 | 5 | | 6 | 1 | 9 |
| | 6 | 4 | 2 | | 1 | 5 | | |
| | | 5 | 9 | | | | | |

Sudoku: Bersiv 38

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 6 | 1 | 3 | 5 | 8 | 9 | 2 | 4 | 7 |
| 5 | 4 | 2 | 7 | 1 | 3 | 9 | 8 | 6 |
| 7 | 8 | 9 | 2 | 4 | 6 | 5 | 1 | 3 |
| 4 | 3 | 8 | 9 | 2 | 7 | 6 | 5 | 1 |
| 2 | 7 | 6 | 4 | 5 | 1 | 8 | 3 | 9 |
| 9 | 5 | 1 | 6 | 3 | 8 | 4 | 7 | 2 |
| 1 | 6 | 5 | 8 | 7 | 2 | 3 | 9 | 4 |
| 8 | 9 | 7 | 3 | 6 | 4 | 1 | 2 | 5 |
| 3 | 2 | 4 | 1 | 9 | 5 | 7 | 6 | 8 |

## Quncika Têgînan

| Biryar | Li ser kirina tiştekî yan awayê kirinê bijartin, ferman, yan li hevkirin. Qerar |
|---|---|
| Biryardarî | Israr, israra di biryarê de |
| Erk | Tişta ku divê kesek bike. Wezîfe, peywir: Parastina welat erkê me tevan e. |
| Erkdar | Kesê bi karekî hatî wezîfedarkirin. Wezîfedar. |
| Maf | Tişta ku qanûn yan jî çanda civakekê rê didinê ku bê kirin. Heq: Azadî mafê her kesî ye. |
| Mafdar | Kesê ku mafê kirina tiştekî jê re heye. Xwedîheq: Ez di gotina xwe de mafdar im. |
| Polîtîka (Îtalî) | Diyarkirina pirsgirêkan û çareserkirina wan. Siyaset |
| Rewşenbîr | Kesê di mijara çand û civakî de jîr, zana û têgihiştî. Ronakbîr, entelektûel |
| Sîvîl (Fransî) | Kesê ne leşker. Medenî |
| Wane | Demek ya fêrbûnê. Ders |

# Sê jinên şoreşger, sê can û yek rê !


Rêya Sakîne Cansiz, Fîdan Dogan û Leyla Şaylemez li Dîasporayê li bajarê Parîsê digihîje hev. Ew li dilê Kurdistanê li Amedê hatibûn oxirkirin û li sê warên cuda bûbûn 3 şitil. ***R-2***



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1029 | 8-Çile- 2023 | www.ronahi.net/ku/

Endamê Komîteya Rêveber a PKK'ê Mûrat Karayilan da zanîn ku planên dewleta dagirker li Zapê asê man.

# ME GOTIBÛ 'AN WÊ BIREVIN AN JÎ WÊ BIMRIN'!



## Pirsên Karayilan ji bo Hulusî Akar

**1-**Heke hûn serkeftî ne, hûn li ser cenazeyên leşkerên ku hê di destê gerîla de ne, çi dibêjin?

**2-**Heke hûn ewqas serketî û serwer bûn, çima we ferman da leşkerên xwe ku, cenazeyên xwe bişewitînin?

**3-**Pozîsyona we ya li rojavayê Zapê têkçû. Hûn ê çawa vê têkçûna xwe ya eşkere, veşêrin?

**4-**We tevî Tayyîp Erdogan, tenê ji bo parastina desthilatdariya xwe, bi plansaziyên xeyalî û taktîkên şer ên şaş, di nava 8 meh û nîvan de hûn bûn sedema mirina 2 hezar û 800 zarokên gelê Tirk. Li hemberî vî tiştî bi rastî jî we wijdanê xwe da ber lêpirsînê?...

## 'Kirîza Sûriyê wê tenê bi destê gelên Sûriyê bê çareserkirin'



Endamê Meclisa Suriya Demokratîk ya herêma Efrînê Mihemed Hesen diyar kir ku armanca civînên sêalî yên di navber hikumeta Şamê, dagirkeriya Tirk û Rûsya de têkbirina vîna gelên herêmê ye û got, kirîza Sûriyê tenê wê bi destê gelên Sûriyê bê çareserkirin çareserkirin. **R-5**

## Hevalên Wîsam jî ji ber dorpêçê bi fikar in



Hevalên zarokê bi navê Wîsam Sîdo yê ku ji ber bandorên dorpêça hikumeta Şamê jiyana xwe ji dest dabû bi fikar in ku aqûbeta wan jî wekî ya Wîsam be. ***R-6***

## Gerîlayan derbên giran li dagirkeran xistin



HPG'ê ragehand ku gerîlayên Azadiyê li Zap, Xakurkê û Qada Berxwedanê ya Girê FM, derbeyên giran li artêşa Tirk a dagirker xistin û got, Artêşa Tirk a dagirker bi çekên qedexekirî êrişî qadên berxwedanê kir. ***R-3***

## Kongra Star: Em ê bi misogerkirina Şoreşa Jinî tolê rakin



Kongra Star şhîdên Komkujiya Parîsê ya 9'ê Çilya 2013'an bi bîranîn û got, em ê tola xwe bi mîsogerkirin û bilind kirina şoreşa jinê bigrin. ***R-3***





Zozan CIZÎRÎ
**ŞEVA WIJDANÊ; WÎSAMÊ...**
*R-2*


Idrîs Henan
**Tirkiyê Derewa Mezin....**
*R-5*


Farûk Sakik
**Sakîne "Cansiz"**
*R-4*

# Sê jinên şoreşger, sê can û yek rê !

Rêya Sakîne Cansiz, Fîdan Dogan û Leyla Şaylemez li dîasporayê li bajarê Parîsê digihîje hev. Ew li dilê Kurdistanê li Amedê hatibûn oxirkirin û li sê warên cuda bûbûn 3 şitil.

Sê jinên Kurdistanî li cih û demên cuda da tên dinê. Ji bo ku çarenûsa gelê kurd biguherînin li ser heman rêyê gihîştin hev. Her sê jinan jî ji bo azadiya Kurdistanê têkoşiyan û tev li karwanên nemiran bûn.

**Darbestên 3 jinan li Amedê hat rakirin**

Rûpelên salnameyan 9'ê Çile 2013'an nîşan dida. Li paytexta Fransayê li Parîsê ji damîzrenerên PKK'ê Sakîne Cansiz (Sara), Nûnera Parîsê ya Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) Fîdan Dogan (Rojbîn) û endama Tevgera Ciwanên Kurd Leyla Şaylemez (Ronahî) ji aliyê kujer ango tetikkêş Omer Guney ve hatin qetilkirin. Cenazeyên her sê cangoriyan bi heman balafirê şandibûn Amedê. Cenaze ji aliyê sed hezaran kes ve hatibû pêşwazîkirin. Li Amedê merasîmek bi heybet ku hema bêje di dîroka Kurdistanê de yekem car bû hatibû lidarxistin. Piştî merasîma li Amedê cenazeyê Cansiz şandin Dêrsimê, cenazeyê Dogan şandin Mereşê û cenazeyê Şaylemez şandin Mêrsînê.

Cenazeyê wan li bajarên ku bi hesreta wan mabûn, hatin veşartin. Têkoşîna her sê jinên têkoşer ên kurd îro jî ji bo têkoşîna azadiya jinên Kurdistanê bûye ronahî.

**Fîdan Dogan**

Yek ji van jinên pêşeng jî Fîdan Dogan e. Ew piştî Komkujiya Mereşê ku di 19'ê kanûna 1978'an de qewimîbû di 17'ê çileya 1982'yan de li gundê Malo Bûtan ê bi ser navçeya Elbîstana Mereşê ve tê dinê. Navê metika wê ya mezin lê kiribûn. Hê ew 2 salî ye malbata wê ji ber sedemên aborî di sala 1984'an de koçî Frnsayê dike. Dogan bi du wişkên xwe re li cem pîrka xwe li gund dimînin. Heta pola duyemîn a dibistana destpêkê li gund dixwîne. Dogan di 9 saliya xwe de bi du xwişkên xwe re diçe Fransayê cem malbata xwe. Dogan piştre di 17 saliya xwe de tê gund û ew li gund ciwanên zanîngehê dixwînin nas dike û têkoşîna xwendekaran bandorê li ser wê dike. Dogan li bajarê Strasburgê yê Fransayê dibistana navîn û lîseyê diqedîne. Ew cara pêşî li Komeleya Çanda Kurd tev li çalakiyên hunerî dibe û girêdana wê ya bi têkoşîna azadiya Kurdistanê re zêde dibe û ew dest bi xebatên têkoşînê dike.

**15'ê Sibatê ji bo wê bû qonaxek destpêkê**

Dogan her çiqas li Fransayê mezin bibe jî lê di nava malbatek welatperwer de mezin dibe û ji bo wê 15'ê Sibata 1999'an wexta ku Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan radestî Tirkiyeyê tê kirin, ji bo wê dibe qonaxek nû û destpêka têkoşînek aktîf. Kenê li ser rûyê wê qet kêm nabe û bi dilnizmiya xwe di hişê mirovan de maye. Wê li dîasporayê têkoşînek bênavber kir. Di xebatên ciwanan de cih girt û piştî demekê biryar digire ku navê xwe biguherîne û navê Rojbîn li xwe dike.

**Herî dawî nûnera KNK'ê bû**

Dogan piştî demekê li Navenda Enformasyonê ya Kurdistanê dest bi xebatên têkoşînê dike. Ev navend bû cihê şehadeta wê jî. Dogan demek dirêj li Fransayê û Belçîkayê û gelek deverên din ê Ewropayê xebatên dîplomatîk meşand. Ew bi kesayeta xwe ya ku mirovên li hemberî xwe qanih bike dihat nasîn. Dogan di sala 2007'an de berdevkiya çalakiya greva birçîbûnê ya ji bo Komîteya Pêşîlêgirtina Îşkenceyê (CPT) şandeyek bişîne cem Rêberê PKK'ê



Abdullah Ocalan kir. Dogan di sala 2011'an de wek berpirsiyara Buroya Enformasyonê ya Kurdistanê xebitî. Êdî ew ji hemû xebatên dîplomatîk ên Fransayê berpirsiyar bû û Nûnera KN''ê bû. Heta roja hat qetilkirin jî dixwest bi xebatên dîplomatîk bala raya giştî ya cîhanê bikişîne ser têkoşîna azadiya kurdan.

**Leyla Şaylemez**

Jina herî ciwan jî Leyla Şaylamez bû. Di 1'ê çileya sala 1988'an de li Mêrsînê wek zaroka malbatek welatparêz a kurd tê dinê. Navê ji pêşengên têkoşîna jina kurd Leyla Qasim lê hatibû kirin. Bi salan şûn wê bavê bigota, "keça min heqê navê xwe da…"

Malbata Şaylemez ji navçeya Licê ya Amedê ji ber zext û zordariya dewletê 37 sal berê koçî Mêrsînê dike. Ew zaroka pêncemîn a malbatek ku 8 zarokên wê hebûn. Hê Leylayê du salî ye bavê wê Cûmalî Şaylemez ji ber zexta dewletê koçî Almanya dibe. Leyla Şaylemez di sala 1994'an bi 5 xwişk û birayê xwe re ew jî koçberî Almanya dibin û 2 sal şûn ve dayik û 2 xwişk û birayê wê koçî Almanya dikin.

**Jiyana li sirgûnê**

Şaylemez û malbata xwe li bajarê Halle yê eyaleta Sachsen-Anhalt a Elmanyayê bi cih bûn, bi salan di nava şert û mercên giran de têkoşîna jiyanê dan. Malbata wê zarokên xwe dibirin komeleyên kurdan da ku li gel xwendina li dibistanên almanî ji nirxên xwe yên çandî dûr nekevin. Şaylemez ku di nava komên folklorê de cih girt, bi kesayeta xwe ya bienyad di bîra mirovan de ma. Şaylemez piştî xwendina 9 salan dest bi amadekariyên çûna zanîngehê kir, di vê navberê de dest bi naskirina tevgera kurd kir û bi awayekî aktîf beşdarî xebatên têkoşîna azadiya kurd bû. Di sala 2008'an de li gelek deverên Ewropayê xebatên ciwanan meşand.

**Hesreta wê ya mezin Amed bû**

Şaylemez ku di sala 2010'an de tev li PKK'ê bû, 2 sal şûnde ji ber pirsgirêkên tenduristiyê vegeriya Ewropayê û ji cihê ku lê hiştibû bi awayekî çalaktir xebatên xwe domand. Şaylemez ku hesreta wê ya herî mezin dîtina Amedê û tevlibûna Newroza Amedê bû. Lê canê xwe kir qurbanê wê axa ku bi hesreta wê dijiya û li pey wê têkoşînek bêdawî ma.

**Yenî Ozgur Gundem**

## ŞEVA WIJDANÊ; WÎSAMÊ DILQERISÎ!



Zozan CIZÎRÎ

De were rojên sir û seqema çilê zivistanê mirov ji agir mehrûm be! Jan bide dilê te û tiştek nebe tu xwe pê germ bikî! Û qerîsek lingê te wek qeşayê bicemidîne, dest û dilê te bitevizîne, lê çareyeke te nebe! Ji taya sermayê xewa te neyê û hemû rayên canê te bêruh bimînin!

Li ber mirina Wîsam Sîdo yê ji ber sir û seqemê, nebûna pêdiviyeke agirkirinê jiyan bû, gelo kî karî wê şevê xew bike, kîjan mêjî rihet kir û bi germî xwe li nav nivînên xwe pêça!? Artêşa ne-mêran a Şamê ya rê nade Rêveberiya Xweser a Bakur-Rojhilatê Sûriyê mazotê ji gelê me yê Şehba û Şêxmeqsût re bişîne, hezar dek û dolabên dijminane li ser gelê me dimeşîne, bila êdî ji mirovbûna xwe şerm bike ku piçek hest û rûmet li cem wana mabe! Ew kujerên xedar, parsek û bê wijdan ên Wîsamê 4 salî, mohra xwe li binê kuştina zarokên me Kurdan dan. Vêca wê bi çi rûyî, bi çi exlaqî bên û pêl axa Rojava ya bi xwîna hezaran keç û xortên me yên leheng pîroz bûyî, bikin? Hukûmeta Şamê ya vê zilmê li gelê me dike, gelo difikire êdî wê çawa ew dayîk û bavê birîndar deriyê xwe li wan veke? Wê bi çi rûyî derkevin pêşberî tevahî gelên Bakur-Rojhilatê Sûriyê? Wekî vê gelek pirs hene ku, bêbersiv dimînin.

Gelê Şêxmeqsûd û Şehba bi wateya rast îro berxwedaneke dîrokî raber dikin. Berxwedana Şêxmeqsûd û Şehbayê belkû bi van bûyerên jandar dilê me diêşîne, lê vîna serkeftinê, hêviya Kurdistana Azad xurt dike.

Lewre em wek jin û gelê Kurd dizanin roj ne roja girêdana şînê ye; roj roja bilindkirina têkoşînê ye, roj roja piştgiriya civakî ye, roj roja berxwedana dîrokî ye. Erê kesera dayîk û bavê Wîsam bû xema Kurdistanê, lê heqîqetek jî eşkere kir ku, ger em bi hemû hêz û hebûna xwe vê mecala Şoreşa Azadiyê ya Rojava negihînin serî, serpêhatiya bi hezaran Wîsaman li ber derî ye. Lewre, ji bo êdî Wîsamên nû ji vê zilmê rizgar bibin, di nava bêçaretiyê û bindestiyê de jiyana xwe ji dest nedin, ji mafê jiyaneke azad bêpar nemînin, şertê esasî bilindkirina têkoşîna azadiyê ye. Barê li pêş me giran e elbet, lê rûmet û nirxê wê yê dîrokî, civakî ji nivîna nav lihêfên germ a sernizm hezar qatî çêtir e.


Heqîqet ev e ku, tu welatekê heya serxwebûna xwe bi dest xistiye bi rihetî ev pêvajoyên berxwedanê derbas nekirine. Car hebûye welat wêran û kavil bûne, kevir li ser kevir nema ye. Lê hêza berxwedêr a civakî taliya talî berê serkeftinê bi aliyê xwe de daye û cihê xwe di nav rêza gelên serfiraz de daniye. Lewre bersiva Wîsaman, ji bo avakirina welatek azad û demokratîk êdî bûye sonda me tevahî jin û dayîkên Kurd. Em xwediyên jiyanê ne, em xwediyên azadiyê ne, em xwediyên Wîsaman e. Di vê wateyê de jinên bi dirûşmeya "JIN, JIYAN, AZADÎ" meydanan tijî dikin hêviya xweşiyê, hêviya starê ji tu kesî nakin, ji ber ew bi xwe hêza çareseriyê ne. Û mifteya serkeftin û serfiraziya civakî jî, îro di destê van jinên serhildêr de ye.

# Serhildana jiyanê 112 roj li pişt xwe hişt

Navenda Nûçeyan

**Serhildana 'Jin, Jiyan, Azadî' ya piştî qetilkirina Jîna Emînî li seranserê Rojhilatê Kurdistanê û Îranê dest pê kirî, tevî hemû hewldanên ji bo tepisandina serhildanê jî di roja xwe ya 112'emîn de didome.**

Serhildana şoreşgerî ya gelên Îranê ku piştî qetilkirina jina Kurd Jîna Emînî li Rojhilatê Kurdistanê dest pê kirî, rejima Îranê ya dik-



tator ji bo tepisandina serhildana ku li seranserê welat belav bûye, serî li her cure êrişan dide. Lê, xwepêşandêr li dijî wan zextên rejîmê jî berxwedana xwe didomînin û ev berxwedana bê hempa 112 roj li pişt xwe hişt.

**Malbata 15 girtiyên siyasî çalakiya rûniştinê li dar xist**

6'ê mehê, 15 malbatên girtiyên serhildana "Jin, Jiyan,Azadî", ji bo şopandina rewşa zarokên xwe di greva birçîbûnê de li ber girtîgeha Kachuî ya bajarê Karajê kom bûn. Li gor agahiyên hatin destxistin, girtiyên bi navê Elham Mosleh Heyderzadeh, Nîlûfer Shakerî, Marzieh Mîrghasemî, Shahrzad Derakhshan, Fatemeh Nazarînejad, Hamîdeh Zareî, Armîta Abbasî jî di nav de ne, ji bo şermezarkirina berdewamkirina rewşa girtin û diyarnebûn û lêpirsînkirina dozan û nebûna lêpirsîna dozan, dest bi greva birçîbûnê kirin.



# Sala 2023'ê sala Melayê Cizîrî ye

HRRK'ê ragihand ku sala 2023'an sala Cizîrî ye û xwest xelk destekê bide banga wan da ku Melayê Cizîrî ji nav destên dijminên ziman û dîroka Kurdan rizgar bikin û ji dinyayê re bibêjin, Melayê Cizîrî ne bi tenê sofî, oldar û bawermendekî Îslamî ye, lê ew helbestvanekî pirr mezin ê helbesta klasîk a Kurdî ye.

Komîteya Hevgirtina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê (HRRK) bi daxuyaniyekê sala 2023'an weke sala Melayê Cizîrî bi nav dike û radigihîne ku ev yek ji bo warê rewşenbîriya Kurd û Kurdistanî cihê şanaziyê ye.

Di vê salê de, dê HRRK wê hewl bide ku pirraniya xebat û çalakiyên xwe der barê helbestvanî, jînenîgarî, rol û bandor, felsefe û raman, dîwan û şiroveyên dîwanê, bawermendî û sofîtiya Melayê Cizîrî li dar bixe, û bi alîkariya panel û semîner û konferansan, HRRK wê bi hewldanên xwe yên berfereh bike ku helbestvaniya Melayê Cizîrî ya bê hempa zeft bike û Melayê Cizîrî weke şahê helbesta Kurdî ya klasîk biçesipîne.

Her wisa bi vê helkeftê, HRRK dê "Xelata Melayê Cizîrî ya helbestê" jî damezirîne û salê carekê dê xelatê diyarî helbestvanekî Kurd ê behremend û dahêner bike.

**'Cizîrî ji nav destên dijminên ziman rizgar bikin'**

HRRK'ê di daxuyaniya xwe de got, "Em bi vê daxuyaniyê dengê xwe digihînin sazî û dezgehên ragihandinê, yekîtî û hevgirtinên nivîskar û rewşenbîran, komele û weqfên ziman û çand û hunerê Kurdî, peymangeh, înstîtû, zanîngeh û zankoyên Kurdistanê hemûyan, tevahiya xemxwar û dilêşên helbest, ziman û wêjeya Kurdî (çi li hundir û çi li derve) da ku destekê bidin banga me da em Melayê Cizîrî ji nav destên dijminên ziman û dîroka Kurdan rizgar bikin û ji dinyayê re bibêjin, Meleyê Cizîrî ne bi tenê Sofî û oldar û bawermendekî Îslamî ye, lê ew helbestvanekî pirr mezin e ji nava helbestvanên Kurdan ên klasîk."

**Konferanseke nevneteweyî ji bo Cizîrî**

HRRK'ê da zanîn ku ew bi vê daxuyaniyê dengê xwe digihînin Hikûmeta Herêma Kurdistanê û Rêvebiriya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku, di sala 2023'yan de hewldanên xwe yên berdewam û dilsojane bikin da ku konferanseke navneteweyî bi navê Melayê Cizîrî li dar bixin û Kurdolog, pispor û lêkolîneran li bin sîwana Melayê Cizîrî li hev bicivînin.

**Mela bi helbest û raman e**

Di dîroka Kurdan de ji kesên girîngtirîn yek jî Melayê Cizîrî ye. Mela him bi helbestên xwe him jî bi raman û baweriya xwe di dilê Kurdan de xwedî cihekî taybet e. Navê wî yê rastîn Şêx Ehmed e. Di helbestên xwe de bi pirranî du nasnav bi kar anîne, Mela û Nîşanî. Li Cizîrê hatiye dinyayê. Di warê jidayikbûna wî de dîrokeke misoger nîne. Hinek çavkanî sala 1567'an, hinek ya 1570'yî, hinek jî ya 1589'an jidayikbûna wî nîşan didin. Lêkoler van dîrokan jî ji hesabê ebcetê derdixin. Lê mirov dikare sala 1570´yî wek sala jidayîkbûna Mela bihesibîne. Di sala 1640´î de dîsa li Cizîrê çûye ber dilovaniya xwedê û gora wî niha li "Medresa Sor" e.

**Te bi Şîrazî çi hacet?**

Mela li cem bavê xwe Mela Mihemed dest bi xwendina xwe ya seretayî kiriye. Dûre ji bo dewamkirina xwendina xwe çûye Amedê, gundê Setrabasê. Wekî din jî li Hekarî, Amediyê, Iraq û Misrê jî xwendiye. Piştî xwendina xwe diçe Heskîfê. Li wir li ba Mîrê Heskîfê Melîk Kamil dimîne, lê dilê wî dikeve keça Melîk Kamilî, Selmayê. Ji ber vê eşq û evîna xwe, di sih saliya xwe de dest bi helbestan dike û ne tenê di nava Kurdan de li cîhanê dibe helbestvanekî bijare. Bi rastî jî Mela di helbestvaniya xwe de ji Mewlana û Şîrazî û Goethe ne kêmtir e. Heta vê yekê ew bi xwe jî di helbesta xwe ya li jêr de wiha diyar dike:

**"Ger lu'lu yê mensûr ji nezmê dixwazî**

Wer şi'rê melê bîn, te bi Şîrazî çi hacet."




**'Evîn' li hêmanên bingehîn zêde dike**

Felsefeya Mela: Feylesofê Yewnan Thales, weke hêmana bingehîn rahiştiye avê, Anaximenes wek hewayê rahiştiyê, Herakleitos weke agir pê daketiye, Empedokles çar hêmanan tîne ba hev û weke av, ax, agir û hewayê radihêje wan. Lê Melayê Cizîrî li van hêmanan yeke din jî zêde dike û dibêje "evîn" jî yek ji hêmanên bingehîn e. Gava ev çar hêman mirovan berdin jî, evîn mirovan bernade û her û her bi wan re dimîne.

**Weke şebçiraxekî her pêxistiye**


Lê paşê ev eşq û evîn ji hev qetiyan û li giyanber û negiyanberan belav bûn. Ev eşq û evîn ket axa welatan, lewma mirov ji welatên xwe hez dikin, ket rûyê jinan, lewma mirov ji wan hez dikin, ket dêr û kenîşteyan, lewma mirov diçin dêr û kenîşteyan. Li gorî Seydayê Cizîrî, di nava olan de cudatî tineye, hemû yek in. Lewra hemû ji rihekê tên û dîsa diçin derekê. Ew der jî hizûra Xwedê ye. Mirov dikare bêjê Mela him bi helbestvaniya xwe, him jî bi bîr û ramanên xwe, digel ew qas salên bihurî hê jî wekî şebçiraxekê di dilê Kurdistanê de pêxistî ye. Şewqa welatperwerî û dildariya wî hê jî rêya Kurdan ronî dike. *-Ozgurpolitika*

# Bi zanebûn qira zimanê Kurdî tînin!

**Piştî bûyerên dawiya sala 2017'an û nemana desthilata Kurdan a li navçeya Xaneqîn a ser bi parêzgeha Diyale, dibistanên Kurdî yên li nava sînorê rêveberiya Diyaleyê kêm bûne. Hejmara dibistanên bi zimanê Kurdî perwerde li wan tên dayîn, 39 dibistan in, lê niha jî ji ber biryareke hikûmeta Iraqê, hewil tê dayîn, beşek ji wan dibistanan were girtin.**

Beşek ji welatiyên navçeya Xaneqînê diyar dikin ku li Xaneqînê bi awayekî pîlankirî hewil tê dayîn xwendina bi zimanê Kurdî nemîne. Ew her wiha diyar dikin, ji ber ku zanîngehên Herêma Kurdistanê zarokên wan wernagirin, gelek malbat zarokên xwe dişînin dibistanên bi zimanê Erebî.

Welatî Karwan Murteza derbarê




rewşa perwerdeya bi zimanê Kurdî ya li Xaneqînê de dibêje, "Pirsgirêka nemana dibistanên bi zimanê Kurdî ji ber çend sedeman e.Yek jê, mamostayên zimanê Kurdî yên ser bi saziya perwerdeya Diyaleyê kêm in. Pirraniya malbatên Kurd zarokên xwe naşînin dibistanên bi zimanê Kurdî. Ji ber ku li zanîngeh û peymangehên Herêma Kurdistanê wan wernagirin."

Karwan Murteza diyar kir ku siyaseta koçberkirinê bandor li ser xwendina bi zimanê Kurdî hebûye û got, hikûmeta Herêma Kurdistanê jî li navçeyê ti hewildana ji bo bipêşxistina zimanê Kurdî nake.

**Bi hîlekariyan dibistanên Erebî vedikin!**

Derbarê heman mijarê de welatî Casim Mihemed jî dibêje, "Bi hîleyeke siyasî çend dibistanên Erebî hatin vekirin. Dibistanên bi zimanê Kurdî ti piştgiriyekê ji hikûmeta Iraqê wernagirin. Pirtûk û sîstema dibistanên bi Kurdî ji aliyê Herêma Kurdistanê ve tên dayîn. Lê pirsyarên ezmûnan hemû ji Bexdayê tên. Vê yekê jî wisan kiriye ku xwendekar berê xwe bidin dibistanên bi zimanê Erebî."

Casim Mihemed rexne li rêveberiya giştî ya zimanê Kurdî ya li Wezareta Perwerdê ya Iraqê kir û got, "Rêveberiya Giştî ya Zimanê Kurdî ya li Wezareta Perwerdê ya Iraqê bi kêrî tiştekî nayê û ji bo xwendekaran tiştekî nake. Dema xwendekareke dibistana Kurdî ser bi Bexdayê be û dibistana amadeyî temam bike, her çiqas pileyên wê bilind bin jî li zanîngehên Herêma Kurdistanê nayê wergirtin. Lê yên pileya wan 95 bin li koleja bizîşkî ya ser bi Bexdayê, tên wergirtin. Ev sedemeke sereke ye.

**Welatî ji bo siberoja Kurdî bi fikar in**

Endamê Yekitiya Mamostayên Kurdistanê Ehmed Mihemed jî li ser mijarê dibêje, "Piştî bûyerên 16'ê Cotmeha 2017'an ti hêviya xelkê navçeyê ji hikûmeta Herêmê nema. Îsal Wezareta Perwerdê ya Iraqê biryarek daye, li gorî biryarê dibistanên Kurdî ku 50 xwendekar tê de ne, divê werin girtin. Vê biryarê welatî xistine nava fikaran. Welatî ketine nava fikareke wisan ku xwendina Kurdî ya girêdayî hikûmeta Iraqê ti sûda xwe ji bo siberojê nîne. Ji ber wê jî zarokên xwe dixin ber xwendina Erebî." *-ROJNEWS*

# Jinên gundê Qeremox malên xwe veguherandine çeperên berxwedanê

Gundê Qeremox ê li Rojhilatê Kobanê ev 10 sal in ku rojane rastî bombebarana dewleta Tirk tê. Jinên gund destnîşan kirin ku wan biryara berxwedaniyê dane û wê pêşengiya parastina warê xwe bikin.

Dewleta tirk ji destpêka şoreşa 19`ê Tîrmeha 2012`an êrîşên bênavber li hember Rojavayê Kurdistanê, Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê pêk tîne. Bi taybetî jî deverên li ber sînor rojane bi êrîş û topbaranê re rû bi rû ne. Kantona Kobanê û gundewarên wê ji Rojhilat heta Rojava li ser xeta sînor e, ji ber vê niştecihên wê bi rengekî rasterast ji aliyê dewleta tirk ve tên armanc girtin.

Dewleta tirk di şeva 20`ê Mijdara 2022`an de bi balefirên şer, balefirên bê mirov, tang, hawin û obîsan herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji Şehba ta Dêrîkê bombebaran kir. Di nava 10 salên şoreşê de ev mezinitrîn êrîşên hewayî yên dewleta tirk bû ku bajar û gundewar hatin bombebaran kirin û di encamê de bi dehan kes jiyana xwe ji dest dan û gelek jî birîndar bûn. Dewleta tirk bi rengekî şereke raghand ku di nava êrîşên wan de, kantona Kobanê armanca sereke ye, ji ber vê gelek deverên Kobanê bi rengekî dijwar hatin bombebaran kirin.

Di nava van deveran de gundê Qeremox jî heye. Ev gundê ku li Rojhilatê Kobanê ye, li ber sînor e yek ji wan gundan e herî zêde rastî bombebaranê tê. Li aliyekî dibistan û nuqteyên tendirustiyê hatin bombebarankirin û li aliyê din jî şêniyên wê hatin hedefgirtin. Hêjayî bibîrxistinê ye ku ev bi salan e gund bênavber tê bombebarankirin, li hemberî vê jî bi dehan çalakiyên mertalên zindî lê pêk hatin ku heta vê kêliyê jî şêniyên gund dest ji malên xwe bernedane.

Di vê çarçoveyê de jinên gundê Qeremoxê behsa berxwedanî û êrîşên li ser gundê wan pêk tên, kirin.

**'Ji ber bombebarana domdar her kêliya jiyana me di xeteriyê de ye'**

Zeyneb Sincar bal kişand ser çawaniya êrîşên ku li ser gund tên kirin û wiha got: "Qeremox gundekî li ber sînor e, ji ber vê ev gund ji destpêka şoreşê ve rojane rastî êrîş û topbarana dewleta tirk tê. Di van êrîşan de hemû cureyên çekan tên bikaranîn. Her wiha dewleta tirk navenda gund, mal, dibistan û nuqteyên tendirustiyê jî bombebaran dike. Her wisa ji ber zeviyên gund di ber sînor de ne, cotkarên ku zeviyên xwe cot dikin û şivanên li pez bi bombebaranê re rû bi rû dimînin. Civata jinan û di dema ku zarok kom dibin û dilîzin jî tên hedefgirtin. Bi taybetî ev 2 meh in ku êrîş dijwartir bûne, zarok ditirsin lê êdî ew jî weke me fêr bûne. Em weke niştecihên gundê Qeremox di rewşeke wiha de dijîn, em nizanin wê di kîjan kêliyê de top û gule li malên me bikevin."

**'Em ê pêşengiya berxwedanê bikin'**

Zeynb Sincar teqez kir ku ew tevî hemû metirsiyên heyî, bi rengekî normal di malên xwe de dijîn û got: "Tevî hemû astengî û metirsiyên heyî, em hê jî di malên xwe de ne û jiyana xwe bi rengekî normal berdewam dikin, kar û xebatên xwe jî dimeşînin. Ev 10 sal in em vê rewşê dijîn, roj bi roj jî berxwedana me mezin dibe. Em ê weke jin jî pêşengiya vê berxwedanê bikin û nirxên şehîdên xwe biparêzin."

**'Me bihustek axa xwe bernedaye'**

Ji aliyê din ve Temra Nesan da zanîn ku dewleta tirk dixwaze gund vala bike û wiha got: "Heger mirov hejmara êrîşên li ser gundê Qeremox bîne ziman, bi dawî nabin. Ji ber vê ev ne cara yekemîn e ku em rewşeke bi vî rengî dibînin. Çiqas topbaran û êrîş li ser herêma Firatê hebin, ewqas jî li ser Qeremox pêk tên. Mirov dikare bibêje ku hemû êrîşên pêk tên li ser gundê jî çêdibin. Ne tenê ziyanên madî her wiha şehîd û birîndar jî çêdibin.



Di vê pêvajoya dawî de, em bi çekên doçka, hawan, obîs, sîûqast, balafirên bê mirov û hwd. hatin bombebarankirin. Em di zanebûna van êrîşan de ne, dewleta tirk dixwaze gundên li ser sînor vala bike ango me di gund de dorpêç bike da ku bi rengekî rehet êrîş bike. Em jî tu carî vê yekê qebûl nakin, ji ber vê em bi îsarar in û tevî hemû xeteriyên ku em bi wan re rû bi rû dimînin jî me bihustek ji axa xwe vala nekiriye. Berovajî, me zeviyên xwe çandin, diçin û tên weke ku tiştek tune be."

**'Biryara me berxwedan e'**

Temra Nesan got ku dewleta tirk sûcên şer li gundê Qeremox pêk tîne û wiha axivî: "Dewleta tirk tenê di gundê me de bi dehan sûcên şer kiriye. Ew zarokê ku lingê wî di encama bombebaranê de qut bû, dibistanên zarokan ên tên hedefgirtin û cihên tendirustiyê jî heger ev hemû ne sûcên şer bin gelo mirov dikare di bin kîjan navî de pênase bike. Mala min bi xwe ji ber bombebaranê kunkunî bûye, heta piraniya malên gund wiha bûne. Lê em ê bi ku ve biçin, em koçberiyê napejirînin ji ber ku ne çareserî ye û heger mirin hebe bila di warê me de be. Ev yek jî biryara tevahî niştecihên gund e. Dema ku saetek dengê bombebaranê neyê êdî zarok jî dibêjin gelo îro çi heye deng tune ye. Yanî em rojane vê rewşê dijîn."

***JÎNHA***

# Hevalên Wîsam jî ji ber dorpêçê bi fikar in

**Hevalên zarokê bi navê Wîsam Sîdo yê ku ji ber bandorên dorpêça hikumeta Şamê jiyana xwe ji dest dabû bi fikar in ku aqûbeta wan jî wekî ya Wîsam be.**

Ji ber sermayê û nebûna rêbazên germkirinê ya ji ber dorpêça ji hêla Firqeya 4`an a hikumeta Şamê li ser taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê, 2 zarokan jiyana xwe ji dest da; pitikê bi navê Hisên Ebdullah Kîbar (17 rojî) û Wîsam Sîdo (4).



Hevalên Wîsam ên li taxa Şêxmeqsûdê ya Helebê ji dubarebûna trajediya hevalê xwe metirsîdar in.

Zarokê bi navê Salih Hesen wiha got: "Me sibehê bi hev re dilîst, lê sermayê Wîsam ji me bir û em naxwazin ev yek dubare bibe."

Zarokê bi navê Wîcan Salih jî wiha got: "Min Wîsam wek birayê xwe yê biçûk dihesiband û ez bi mirina wî pir xemgîn bûm. Ji ber hevalê me bû û em bi hev re dilîstin."

Wîcan hêvî kir ku tu zirar negihêje xwişk û birayên wê û dostên wê yên li taxê pê re dilîze.



Her wiha zarokê hîna 4 sal derbas nekiriye yê bi navê Receb Salih jî wiha got: "Wîsam hevalê min ê nêz bû." Lê ji ber ku Receb Salih tiştekî li ser mirinê nizane, ji wî ye Wîsam çûye cihekî û dê di demeke nêz de vegere û dîsa bi wî re bilîze.



Yek ji rêbazên sekna li hember seqema zivistanê û tunebûna madeyên germkirinê, zarokên li taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê di rojên sayî de li kolanan in da ku xwe germ bikin.

Taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê ji ber dorpêça tund a Firqeya 4`an a hikumeta Şamê azaran dikişînin û bandorên wê ji zêdetirî mehekê ve diyar bûn. Ji qutbûna kehrebeyê di 27`ê Mijdara 2022`yan heta bi mirina 2 zarokan de.

***ANHA***



# Kongra Star: Em ê bi misogerkirina Şoreşa Jinî tolê rakin

Kongra Star şehîdên Komkujiya Parîsê ya 9'ê Çileya 2013'an bi bîranîn û got, em ê tola xwe bi mîsogerkirin û bilind kirina şoreşa jinê bigrin.

**Navenda Nûçeyan**

Bi wesîleya salvegera 10'emîn a şehadeta Sakîne Canisiz, Fîdan Dogan û Leyla Şaylemez, Koordînasyona Kongra Star daxuyaniyeke nivîskî weşand.

Kongra Star di daxuyaniya xwe de şehîd komkujia Parîsê bibîr anî û got: "10'mîn salvegera komkujiya Parîsê de em şehîdên xwe yên nemir Sakîne Cansiz (Sara), Fîdan Doğan (Rojbîn) û Leyla Şaylemez (Ronahî) bi minetdarî bi bîr tînin, bejna xwe li hemberî wan ditewînin. Em dewleta Tirk a qirker û hêzên komploger bi hêrs û nefret şermezar dikin û soza tolhildana şehîdên xwe dubare dikin."



**'Ji bo berjewendiyan li ser heqîqetê tê girtin'**

Kongra Star diyar kir ku li ser komkujiya Parîsê 10 sal derbas bûye, lê edalet nehatiye pêkanîn û wiha dewam kir: "Qetlîam ji aliyê dewleta Fransa nehatiye ronî kirin. Şûna ku hêzên li pişta vê komkujiyên hov werin tespît û ceza kirin, bi navê siriyeta dewletê û berjewendiyên navdewletî ser heqîqatê tê girtin."

**'Kujer dewleta Tirk e, MÎT e'**

Kongra Star da xuyakirin ku divê Fransa sûcdarên komkujiyê eşkere bike û got: "Ji ber ku komkujiya 9'ê Çile nehatiye ronî kirin, di 23'ê Kanûna 2022'an de komkujiya 2'mîn a Parîsê hate jiyan kirin. Ev jî berpirsiyariya Fransa carek din bi pêş çavan dixe. Di her du komkujiyên Parîsê de kî pêl tetikê kiribe jî kujer dewleta Tirk e, MÎT e. Lazim e Fransa jî sûcdarên esasî derbixîne holê, bidarize û ceza bike."

**'Armanc tesfiyekirina şoreşa jinê ye'**

Kongra Star da xuyakirin ku bi komkujiya Parîsê dewleta Tirk a faşîst pêvajoyeke nû li hemberî tevgera jin daye destpêkirin û wiha got: "Komkujiya Parîsê di pêvajoyeke ku bi pêşengtiya jinê li Rojavayê Kurdistanê şoreşeke nû hilbirî, pêkhat. Ji bo tasfiye kirina şoreşa jinê biryarê qetilkirina pêşengên jinê girtin. Di çarçoveya vê konseptê bi dehan jinên pêşeng û şoreşger ji aliyê dewleta Tirk ve hatin şehîd xistin."

**'Em ê tola xwe bi bilindkirina şoreşa jinê bigrin'**

Koordînasyona Kongra Star diyar kir ku ew ê tola xwe bi mîsogerkirin û bilindkirina şoreşa jinê bigrin û wiha got: " Bersiva me ji bo bîranîna şehîdên xwe bilindkirina têkoşînê heya serkeftinê ye. Wek tevgera azadiya jin Kongra Star em şehîd xistina pêşengên xwe tu car qebûl nakin, efû nakin, ji bîr nakin. Hesabê wan sûcên navnetewî teqez bê pirsîn. Emê tola xwe bi mîsoger û bilind kirina şoreşa jinê bigrin."

# Gerîlayan derbên giran li dagirkeran xistin

**Navenda Nûçeyan**

**HPG'ê ragehand ku gerîlayên Azadiyê li Zap, Xakurkê û Qada Berxwedanê ya Girê FM, derbeyên giran li artêşa Tirk a dagirker xistin û got, Artêşa Tirk a dagirker bi çekên qedexekirî êrişî qadên berxwedanê kir.**

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê bi daxuyaniyekê ragehand ku tîmên wan yên gerok li Zap, Xakurkê û Qada Berxwedanê ya Girê FM bi çekên giran li dagirkeran dan.



HPG'ê diyar kir ku artêşa Tirk a dagirker çeperên berxwedanê yên gerîla yên nêzî herêma Çemço ya girêdayî navçeya Şêladize ya navçeya Amediyê bi bombeyên qedexekirî bombebaran kir, di heman demê de qadên gerîla bi dehan caran bi obus, hawan, tank û çekên giran hatin bombekirin.

HPG'ê da xuyakirin ku di çarçoveya Pêngava Şoreşger a Bazên Zagrosê de li herêma Zapê, di 6'ê Çileyê de danê nîvro li derdora herêma Çemço ya Şêladize ya navçeya Amediyeyê tîmên wan yên gerok bi çekên giran li dagirkeran dan. HPG'ê herwiha da zanîn ku di çarçoveya Pêngava Şoreşger ya Bazên Zagrosê de li herêma Xakurkê, di 6'ê Çileyê de li Qada Berxwedanê ya Girê Şehîd Axîn tîmên wan yên gerok bi çekên giran li dagirkeran dan.

HPG'ê ragehand ku di çarçoveya Pêngava Şoreşger ya Cenga Xabûre ya Şehîd Savaş Maraş de, di 5'ê Çileyê de saet 14:45'an de li Qada Berxwedanê ya Girê FM tîmên wan yên gerok bi çekên giran li dagirkeran dan.

Êrîşên artêşa Tirk a dagirker

HPG'ê derbarê êrîşên artêşa Tirk a dagirker yên bi bombeyên qedexe û çekên kîmyewî kiriye, wiha got: "Di 6'ê Çileyê de çeperên berxwedanê yên gerîlayan ên nêzî herêma Çemço ya Şêladize ya navçeya Amediyê bi bombeyên qedexekirî hatin bombekirin. Herwiha di 26 û 31'ê Kanûnê û 4'ê Çileyê de herêmên Şukê û Sitûnê yên Avaşînê 5 caran bi balafirên şer hatine bombekirin.

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê da zanîn ku di 5 û 6'ê Çileyê de Girê Şehîd Kamûran û Geliyê Lolan ên Xakurkê, Qada Berxwedana Girê FM û çeperên berxwedanê yên gerîla yên nêzî gundê Sîda û herêma Çemço ya Şêladize ya navçeya Amediyê bi dehan caran bi hawan, obus, tank û çekên giran hatine bombekirin.

# Serhildanên Rojhilatê Kurdistan û Îranê berdewamin

**Navenda Nûçeyan**

**Li Rojhilatê Kurdistanê û Îranê serhildana gel dewam dike, rêjîma Îranê jî li hemberî serhildêran kuştin, binçavkirin û işkencekirin zêde kiriye. Herî dawî 2 xwepêşander ji aliyê rêjma Îranê ve hatin bi darvekirin**

Serhildanên gelên Rojhilatê Kurdistan û Îranê bênavber dewam dikin, rêjîma Îranê jî li dijî serhildanan kuştin, girtin û işkencekirin zêde kiriye. Tevî ku rêjîma Îranê cezayên bi darvekirinê li gelek xwepêşanderên ku hatine biçavkirin biriye jî, xwepêşandan bi biryardarî dewam dikin.




Di 6'ê Çileyê de bi hezaran kes li bajarê Zahîdanê daketin kolanan û li dijî rêjîma Îranê qîriyan. Xwepêşanderan dirûşmeyên, 'Berxwedan Jiyane' û 'Jin Jiyan Azadî ' bilind kirin. Herwiha li bajarê Sine yê Rojhilatê Kurdistanê li çiyayê Awyer jimarek welatî kom bûn û bi dirûşmeya, 'Jin, Jiyan, Azadî' avêtin.

Herwiha li bajarê Sinê jî ciwanên daketin qadan û bi pêxistina agir rê girtin û dirûşmeya, 'Kurdistan goristana faşîstan' bilind kirin. Li çend taxên Tehranê jî welatiyan şeva 6'ê Çileyê , bi dirûşmeyan nerazîbûnên xwe li hemberî rêjîmê anîn ziman.

Di 6'ê Çileyê de li gelek qadên Rojhilatê Kurdistanê û Îranê çalakiyên cuda berdewam bûn.

Li gorî ku hate ragehandin ku ciwanê Kurd yê berî 23 rojan li qada xwepêşandanên li Kerec bi giran birîndar bibû, li nexweşxaneyê jiyana xwe ji dest da.

Herî dawî doh hate ragehand ku rêjîma Îranê sibeha 7'ê Çileyê, Muhamed Mehdî Karamî û Seyîd Muhemed Huseyînî ku bi hinceta tevlî xwepêşandanên li Îran û Rojhilatê bûne, bi dar ve kir. Weke tê zanîn ku ji destpêka serhildanan û heta niha rêjîma Îranê 4 kes bi darvekirin e. Rejîma Îranê berî niha Muhsîn Şikarî, Mecîd Riza Rehnewerd bidarve kiribûn. Serhildana li Rojhilatê Kurdistanê û Îranê didome. Di vê serhildanê de heta niha zêdetirî 500 kes hatine qetilkirin û nêzî 20 hezar kes jî hatine girtin.

# Karayilan: AKP-MHP bûn sedema mirina 2 hezar û 800 zarokên tirk

Mûrat Karayilan diyar kir ku planên rejîma AKP-MHP'ê yên dagirkirina Herêmên Parastinê yên Medyayê bi tevahî, li Zapê asê bûn. Herwiha ragihand ku deshilata AKP-MHP'ê ji bo desthilata xwe di 8 meh û nîvan de bû sedema kuştina 2 hezar û 800 zarokên tirkan.

**Navenda Nûçeyan**

Endamê Komîteya Rêveber a PKK'ê Mûrat Karayilan destnîşan kir ku dewleta Tirk, du sal in ku tevî erêkirina hikûmeta Kazimî ya li Iraqê û piştgiriya PDK'ê ya bi awayekê çalak, hemû teknolojiya hevçax, bombeyên qedexe û çekên kîmyewî nekariya Herêmên Parastinê yên Medyayê dagir bike û wiha axivî: " Planê wan li dîwarê Gerîlayên Azadiya Kurdistanê ket û bin ketin. Ew tu caran li hember gerilayên azadiyê bi serneketîne û bi ser jî nakevin."

Beşê duduyan ya di gotûbêja ANF'ê ku bi Endamê Komîteya Rêveber a PKK'ê Mûrat Karayilan re kirî, Karayilan bal kişand ser binkeftina dewleta tirk ya li herêma Zapê û got, me despêkê jî gotibû 'yan wê xwe vekişînin yan jî hemû wê bimrin'.

Karayilan da zanîn ku plana rejîma AKP-MHP'ê ew bû ku di nava du-sê hefteyan de herêmên Zap, Avaşîn û Metîna bi temamî dagir bikin û piştre di nava çend mehan de dora Garê, Qendîl, Şengal bigirin û van deran jî dagir bikin û got, plana wan li Zapê asê ma û berovajiyê navê operesyonê ew bi xwe kilît man.

Murat Karayilan bibîr xist ku dewleta tirk bi salane dibêje îsal ezê PKK'ê xilas bikim lê, her salê jî bi bin ketiye. Herwiha behsa agahiyên ku ji aliyê wezîrê şer yê Tirk ve hatin dayîn, kir û got, êdî rastiyan jî berevajî dike. Dibêje ku wî di sala dawî de 4 hezar gerîla tasfiye kiriye. Ev bi temamî ne rast e. Di sala 2022'an de hejmara şehîdên me yên HPG'ê bi giştî 301 in. Ziyanên artêşa Tirk û hêzên din ên ewlehiyê ji yên me 10 katan zêdetir e. Ji ber vê hejmara şehîdên me ji dehê yeka wan e.

**Ji bo wezîrê dewleta dagirker Hulusî Akar pirsên Karayilan!**

Karayilan bi binkeftina dewleta tirk ya li hember gerila raxist berçavan û ev pirse ji bo Wezîrê Parastinê yê Tirkiyeyê Hulusî Akar rêz kirin:


1- Heke hûn serkeftî ne, hûn li ser cenazeyên leşkerên ku hê di destê gerîla de ne, çi dibêjin? Li ser vê yekê hûn dixwazin bibêjin çi?

2- Heke hûn ewqas serketî û serwer bûn, çima we ferman da leşkerên xwe ku di 11'ê Îlona 2022'an de ji bo ku cenaze nekeve destê gerîlayan, cenazeyan bişewitînin? Ez meraq dikim, hûn li ser van dîmenan çi dibêjin?

3- Madem we 'Operasyona Kilît' qedand, çima we xwe ji Girê Cûdî, Sêdarê û Girê Amediyê vekişand? Bi rastî, hûn hatine ku van deran bi awayekî mayînde desteser bikin û li vir bi cih bibin. Li rojavayê Zapê hêzên we bi tenê li 2 deran hene. Hûn vê yekê çawa şîrove dikin? Hûn hatibûn van deran hemûyan dagir bikin lê, niha bi tenê li 2 cihan in. Hûn vî tiştî çawa rave dikin?

4- Pozîsyona we ya li rojavayê Zapê têkçû. Hûn ê çawa vê têkçûna xwe ya eşkere, veşêrin? Em bibêjin hûn niha desthilatdar in û hêza we heye ku hûn zextan bikin, hûn dikarin bi gotina 'Artêşa neteweyî' bandorê li hemû derdorên xwe yên medyayê yên li Tirkiyeyê bikin û wan bêdeng jî bikin. Lê gelo sibê hûn ê çawa ser van rewşan bigirin? Divê hûn têkçûna xwe ya li rojavayê Zapê qebûl bikin.

5-We ragihand ku we operasyona



'Pençe-Kilît' qedandiye. Gelo şer û pevçûnên dijwar ên li bejahiya gundên Sîda û Çemço yên girêdayî navçeya Şêladize ya li rojhilatê Zapê didomin, hûn ê çawa rave bikin? Hûn ê çawa ji gelê Tirkiyeyê û raya giştî re diyar bikin ku we tevî ku her tim tank, top, balafir, her cure çekên qedexe û çekên kîmyewî yên hovane bi kar anîn lê dîsa jî we nekarî dagirkeriyê bigihînin encama ku we dixwest? Niha hûn şerên mezin ên bi hemû çekan li wir didome, vedişêrin. Ji ber ku we hemû medya xistiye destê xwe, hêza we têra vî tiştî dike. Lê gelo ji niha û şûnde hûn ê vî tiştî çiqasî veşêrin?

6- Roja ku ferman da ku bila çekên kîmyewî bi awayekî zêdetir û girantir werin bikaranîn, di heman rojê de li ser kursiya Meclîsa dewleta Tirk we berevajî vî tiştî got. Gelo têkiliya vî tiştî bi psîkolojiya we re heye? We sibehê zû fermana bikaranîna çekên kîmyewî da û nîvrokî jî li ber raya giştî wê tiştên berevajî vê got. Ev bi karakterekî çawa dikare were ravekirin? Hûn ê vê dijberiya di navbera gotin û kirina xwe de çawa rave bikin? Wekî 'Elî Kîmyewiyê' Iraqê hûn jî bûne 'Hûlûsiyê Kîmyewî' yê Tirkiyeyê û wisa ketin dîrokê. Gelo ev tişt berhema kîjan taybetiya karakterê we ye?

7- We tevî Tayyîp Erdogan, tenê ji bo parastina desthilatdariya xwe, bi plansaziyên xeyalî û taktîkên şer ên şaş, di nava 8 meh û nîvan de hûn bûn sedema mirina 2 hezar û 800 zarokên gelê Tirk. Li hemberî vî tiştî bi rastî jî we wijdanê xwe da ber lêpirsînê? Hûn bûne sedema mirina evqas kesan gelo ev tişt bandoreke çawa li we dike?

**'Eger tû wêrekbî bersiv bide'**

Karayilan piştî pirsên xwe wiha domand: "Heke tu wêrek bî, ez bang dikim ku tu bersivê bidî van tiştan û berevajiya van tiştan îspat bikî. Tu nikarî berevajiya van tiştan îspat bikî. Ji ber ku ev hemû heqîqet in. We xwe spart F16, dronên bi çek û çekên qedexekirî, we zarokên gelê Tirk bi awayekî ku ji aliyê zanista leşkerî ve nayê ravekirin, şandin ser hêzên me. We got 'Biçin yan bimirin yan jî bistînin'. Bi vî awayî hûn bûn sedema mirina van kesên ciwan. Hûn ê nikaribin ji berpirsyariya vî tiştî birevin."

# Polîtîkaya çewisandina Kurdî heye

**Hevserokê Botan-DER'ê Metîn Kiliçaslan bal bire ser polîtîkayên asîmîlasyonê yên li dijî Kurdî û ji bo xwedîderketina li Kurdî bang li xelkê kir.**

Komeleya Lêkolîna Ziman û Çandê ya Botanê (Botan-DER) ku li Sêrtê hatiye avakirin, li dijî zextên li ser Kurdî û polîtîkayên asîmlasyonê dixebite. Hevserokê komeleyê Metîn Kiliçaslan got, li bajêr li dijî Kurdî polîtîkayên taybet tên birêvebirin û bal bire ser pratîkên qeyûmên şaredarî dagir kirine. Kiliçaslan anî ziman ku li ser Kurdî polîtîkayeke çewisandinê ya sîstematîk heye û got, "Avakirina komeleyê li bajêr bû cihê kêfxweşiyeke mezin. Li bajêr fûryayeke çavtirsandinê ya mezin hatiye afirandin. Extiyarên ku bi Tirkî nizanin jî bi Tirkî bi neviyên xwe re diaxivin. Me di serdanên xwe yên li malan de ev dît. Malbat bi israr bi Tirkî bi zarokên xwe re diaxivin"

**Ji dêvla 'ax Kurdistan' dibêjin 'ax Gulistan'**

Kiliçaslan bi bîr xist ku qeyûm tabelayên bi Kurdî yên li bajêr rakirine û navê park û kolanên bi navê rewşenbîr û nivîskarên Kurd guherandine: "Ji xeynî vê, mudaxileyî stranên li dawetan jî



dikin. Stranên Tirkî tên ferzkirin. Mesela ji dêvla 'ax Kurdistan', dibêjin 'ax Gulistan'. Ev bi tena serê xwe înkarkirin e. Em bang li xelkê bajêr dikin; dawetên xwe bi reng û dengê xwe bikin.

**'Em ê li tax û gundan jî bicivin'**

Kiliçaslan da zanîn ku ev mehek e wan dest bi perwerdehiyê kiriye û ji bo kursên li komeleyê jî got; "Me bi du polan û 4 mamosteyan dest bi perwerdehiya asta yekemîn kir. Miracaetên kursan didomin. Gelek kesan miracaetî komeleyê kiriye. Piştî miracaet bi dawî bibin, em ê polên nû vekin. Me bi asta yekemîn dest pê kir. Paşê em yên didu û sêyan jî bidin. Kesên bên asta mamostetiyê em ê sertîfîkayên wan bidin wan. Paşê kesên mezûn bibin, dikarin bên li vir dersê bidin.

***M.A***

## Sakîne "Cansiz"



Farûk SAKIK

Hin nav û paşnav henin wateya xwe ji xwediyên xwe digirin. Ew nav bi wan re bi vateyek din tê şîrovekirin. Paşnavê Sakîne Cansiz jî wisa ye. Peyva 'Cansiz' di Tirkî de tê wateya , mirî, bêrih, qels. Lê ev peyv ev paşnav di kesayeta Sakîne de tê wateyek cûda. Dema ku digotin Sakîne "Cansiz" wek esas menaya wê nedihat berçavên tu kesî. Ev peyv bi sakîne re naverok û meneya xwe guhert û bû, qehreman, berxwêdêr, cesûr, zindî.

Çîroka vê jina şoreşger, bi naskirina Rêber Apo û hevalên wî dest pê kir. Di salên 1970 de, dema ku bihîst hin ciwan bi navê koma Apociyan bi rêxistin dibin, ji Dersîmê berê xwe da Enqerê û tevlî vê komê bû.

Dema ku li gundê Fîsê wê kongreya damezirandinê bihata lidarxistin, ji Apartmana Gunaydin bi Rêber Apo re ber bi vî gundî bi rê ket. Beşdarî vê civîna(kongreya) dîrokî bû.

Piştî kongreya yekemîn, jiyana xwe bi tevahî da têkoşîna xeta azadiya jînê. Hema bêje li hemû herêmên Kurdistanê geriya, xebatên xwe yên li ser jinan û partiyê domand.

Lê di derbeya leşkerî ya 1980'an de li Elezîz hat girtin û pêvajoya zîndanê, ango ya berxwedanê dest pê kir. Pêvajoya tifkirina rûyê celat Esat Oktay Yildirim; pêvajoya ku dengê berxwedana wê derbasî derveyî dîwarên zîndanan bibe, dest pê kir. Li zîndanê rojek ji Esat Oktay Yildirim re wiha gotibû: "Ez Sakîne Cansiz im, ez şoreşger im û PKK'yî me, ne ji mirinê, ne ji îşkenceyê û ne jî ji heqareta leşkerên te ditirsim. Vê yekê wisa bizane!"

Ji hejmara 5'an a zîndana Amedê, berê xwe da çiyayên azad. Cihê ku dixwest li wê derê bû û li vê derê dîrok hem dinivîsî hem jî di afirand. Vê carê destana tolhildana salan dinivisî.

Sal derbasbûn û êdî di nav civaka Kurdan de wek efsaneyek bû. Lehengî û berxwederiya wê li her deverî belav bû. Li qada gerîla jî wek efsaneyek dihat nasandin.

Di perwerdeyan de berxwedana wê dihat vegotin. Şehîd Evîn Goyî, herî dawî di sala 2002'an de li Qendîlê di kongreyê de Sakîne Cansiz dîtibû. Demek dirêj jî bi hev re mabûn. Evîn Goyî, piştî şehadeta Sakîne Cansiz di hevpeyvînek xwe de wiha digot: "...Cara yekem li Heftanîn in ew dît. Di destpêkê de me bawer nekir ku ew e. Me cesaret nekir ku em nêzî wê bibin. Ji ber ku ew ji bo me efsaneyek bû. Destpêkê de me ew ji dûr ve şopand. Ka çawa diaxive, çawa dimeşe, bi însanan re çawa dide distîne. Bes bi tenê me ji dûr ve li wê nêrî..."

Dijmin ji roja ewil heta roja dawî ew taybetmendî û efsanetiya wê dîtibû,lewma ew xistibû hedefa xwe.

9'ê Çileya 2013'an de li Parîsê bi awayekî hovane, bi fêlbazî û bêbextî ew û du hevalên wê ji aliyê dijmin ve hatin şehit xistin.

Di sala 2006'an de Sakîne ji bo ku kurdan li cîhanê bide nasîn, xebatên avakirina weqfek dimeşand. Di demek wiha de Xalis Kaygalak ji wê re dibêje; divê em li ser nave te 'weqfa Sara' ava bikin. Wek Rosa Luxsenbûrg tu jî ji bo kurdan pir girîngî. Sara bersivek wiha dide: 'Çima wê min jî bikujin? ( Rosa Lûxsenbûrg jî di 19 Çile 1919'an de li Berlînê tê qetilkirin û piştre li ser navê wê weqfek tê avakirin) Û Sakîne Cansiz şehîd ket. Kurd ji wê re ji bo gelek tişt deyndar in.



# 'Kirîza Sûriyê wê tenê bi destê gelên Sûriyê bê çareserkirin'

Endamê Meclisa Suriya Demokratîk ya herêma Efrînê Mihemed Hesen diyar kir ku armanca civînên sêalî yên di navber hikumeta Şamê, dagirkeriya Tirk û Rûsya de têkbirina vîna gelên herêmê ye û got, kirîza Sûriyê tenê wê bi destê gelên Sûriyê bê çareserkirin.

**Zana Roj/ Şehba**

28`ê Kanûna 2022`yan wezîrê parastinê yê Tirk Hulusî Akar, wezîrê parastinê yê Rûsya Sergey Şoygu û wezîrê parastinê yê hikumeta Şamê Elî Mehmûd Ebas, tevî serokên saziyên îstîxbaratan ên her sê welatan li Moskovê civiyan. Dewleta Tirk a dagirker ji destpêka aloziya Soriyê ve êrîşî herêmên bakur û rojhilata Sûriyê dike û hewil dide ku vîna gelan bişkîne, herwiha hikumeta Şamê jî tevî kuştina bi sed hezran welatiyên Sûriyê û koçberkirina bi milyonan, heta niha ti guhrtin di zihniyeta xwe ya nejadperest de çênekir û dixwaze ku desthilata xwe vegerîne wekî beriya kirîzê. Li gorî gelek şîrovekarên siyasî, civîna sêalî ya li Moskoyê ji bo berjewndiyên desthilatan e û li ser gelên Sûriyê bi giştî xeter e.

Derbarê civîna sêalî ya di navbera wezîrên parastinê yên Sûrî, Tirkî û Rûsyayê û armancên wê, endamê Miclisa Sûriya Demokratîk ya Herêma Efrînê Mihemed Hesen ji me re axivî.

Hesen diyar kir ku hikumeta AKP-MHP'ê ber bi hilweşandineke mezin ve diçe û wiha got: "Herdem beriya hilbjartinên Tirkiyê, Erdogan serî li tevayiya rêbazên bê exlaqî dide û gelek tevlheviyê li herêmê derdixe. Di dema neha de jî planên qirêj yên li dijî gelên herêmê datîne. Yek ji van palanan jî lihvikrina bi hikumeta Şamê re ji bo qirkirina gelên herêmê û têkbirina projeyên demokratîke. Di van demên dawiyê de hikumeta AKP ber bi hilweşandineke aborî, civakî û siyasî ve diçe. Êdî gelê Tirk nerazîbûnên xwe dide nîşandan û li dijî desthilatdariya AKP derdikeve."

**'Erdogan wê bi hêsanî dest plana dagirkirina Sûriyê berned e'**

Hesen da xuyakirin ku civînên sêalî ku tên lidarxistin di bin zexta Rûsya de pêk tên û got: "Hikumeta Şamê di van lihevkirinan de nikare tu biryaran bigire, ji ber ku Îran ji van lihevkirinan ne raziye, Esed jî wê gavan neavêje. Herwiha Erdogan jî dixwaze carke din hikumeta Şamê bixapîne û wê bi hêsanî dest ji projeya xwe ya dagirkirina xaka Sûriyê bernede."

**'Armanc civînên Sêalî yên Mosko Têkbirina vîna gelan e'**

Hesen da zanîn ku hikumeta Şamê , dagirkeriya Tirk û Rûsiya dixwazin rê li ber çareserkirina kirîza Sûriyê bigrin û wiha got: "Rûsiya, dagirkeriya Tirk û hikumeta Şamê dixwazin li hesabê xwîna gelan lihevkirinekê bikin, herwiha hewil didin Rêveberiya Xweser lawaz bikin û têk bibin. Ji ber ku ew dizanin ku projeya Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhiulatê Sûriyê riya çareseriya kirîza Sûriyê û bidawîkirina şere, hwil didin ku wê têk bibin. Ji ber dewlemendiya erdîngariya Rojava, hêzên dagirker her yek ji aliyê xwe ve dixwaze xaka me dagir bike û li gorî wê planêna xwe datînin."

'Divê gelê Sûrî yê li herêmên dagirkirî ji xwena xwe şiyar bin'

Endamê Meclisa Sûriya Demokratî ya herêma Efrîn Mihemed Hesen banga li gelê Sûrî yên li herêmên dagirkirî kir ku rê nedin dagirkeriya



Tirk we ji bo berjewendiyên xwe bikar bîne û axaftina xwe wiha qedand: "Dadirkeriya Tirk tu caran ji bo berjewendiyên gelên Sûriyê ti tişt nekiriye, berovajî wê herdem ji bo berjewendî û planên xwe yên qirêj gelên Sûriyê dike qurban. Bela herkes baş zanibe ku dagirkeriya Tirk li ser tevayiya herêmê xetere. Em banga gelê Sûrî yê li herêmên dagirkirî dimînin dikin ku bila bi siyaseta qirkirin û talankirinê ya Erdogan neyên xapandin, êdî divê gelê Suriyê ji xewna xwe şiyar bibe, Erdogan tenê ji bo firehkirina dagirkeriya xwe û ji bo berjewendiyên xwe tevdigere, ji ber wê çareserkirina aloziya Suriyê tenê wê bi destê gelên herêmê bê kirin, gel dikarin tavahî pilanên dagirkeran têk bibin".

## Wê rojekê her kes hesabên kiryarên xwe bide

**Memed Serdar**

Taybetmendiyê dewlet di nava xwede derew, xapandin, bê exlaqî û hemû cûre neheqî dihewîne. Lê mirovên di bin banê wî dewletêde jiyan dikin gelek ji wan yên ne xwendî û nezan vê rastiyê nizanin pê ne hesiyane. Ji ber wê heta roja îro dewlet dikarin mirovan bi heman derewan bixapînin. Civakên asta xwendinê bilind be û xebatên îlmî û fikrî pêşde be, li hember van taybetmendiyên dewletan asteke pir mezin şiyarbûn pêşdikeve. Her wiha civakeke kar û xebatê îlmî û fikrî pêşketibe, bi xwere îrade û fikirandina azad pêşdixîne. Ev rastî roj bi roj pêwîstiya dewlet kêm dike û bi demêre saziya dewletek xûrt û desthilatdar namîne. Sazîyek biçûk ku çend mijarên xizmetgûzarî rêxistin bike û ji derve temsîla wê civakî bike dimîne. Hebûna saziya dewletê weke niha civak nefikirîn e û ji bo berjewendiyên xwe yên kesayetî û çînî jî, civak tevahî qurban kirin e.

Dewletên niha binerin, hebûna wan li ser çi esasî û çi pîvanî ne. Dewletên li rojhilata navîn hene pirsgirêkên ku jiyan dikin, tevahî pirsgirêkên demokratikbûnê ne. Mesela li Îran'ê weke tê zanîn ev 5 meh zêdetirin serhildanên gel hene. Beriya niha jî gelek caran bi sedemên cûda gel rabûn ser piyan. Di wateya gîştî de gelê Îran`ê çi daxwaz dikir. Tevahî serhildanande daxwazê gel hinek din demokratikbûn bû. Ji bo ji desthilatdariya xwe kêmek jî tawîz nedin, bi hezaran kes hatin kûştin.

Her wiha li Sûrîyê jî heman rewş heye. Destpêka serhildanên bahara gelan de gelê Sûrîyê bi daxwaza demokratîkbûnê rabûn serhildanan. Destpêkê daxwaz û xwastekê wan jî pir gûncaw bûn, di asta çend sererastkirinên demokratik de bûn. Dema ku daxwazên gel bi hişkayî û bi êrîşan hat bersivdayîn, rewş her çû girantir bû. Ji xwe dewletên weke marê kor Tirkiyê jî li teniştê bendê tişteke wiha bûn, ka kîjan bikeve ji bo ew jî bixwe. Piştî ku ji dervede jî destdirêjî çê bû alozî û tevlîhevî gîhîşt rewşeke wiha ku çareserî pir zehmet bû. Her du alî gefên pir giran ji hev xwarin û bi taybet jî dewleta dagirker ya Tirkiyê bi tevahî gûhertina nîzam û bi destxistina Sûrîyê kir hedefê xwe û ji bo wî kar kir. Koçberên bin destê xwe, weke bedîlê rêveberiyê Sûriyê xwast amade bike. Lê hemû cîhan li Efrînê dîtin ku çeteyên ku Tirkiye wan perwerde kiriye, tenê dizî, talan û revandina jinan e dizanin. Aliyê din de jî, rêjîma Sûrîyê heta rojame ya îro li hember daxwazên demokratîkbûnê, ji bo gaveke pir hêsan jî ne amadeye. Bi desthilatdariyê xwe ewqas girêdayîne ku rewşa gelê xwe û daxwaza wan naxwazin bibîhîzin. Ev 10 sal zêdetire şer û alozî heye bi sed hezaran mirov jiyana xwe hûndakirine bi milyonan mirov koçber bûne. Heta niha jî rêveberiya Sûrîyê çareseriyê ku pêşniyar dike, dibêje her kes vegerin cîh û warên xwe wekî ku qet tiştek nebûye em jiyana xwe weke beriya sala 201'an berdewam bikin. Yek pêşniyarê rêjîma Sûriyê ev e. Ji vê nêzîkatiya wan jî xuya dibe ku ne ji siyasetê ne jî sosyolojiya civakê qet fêm nakin û qet hesab jî nakin. Li ser ew kas paşverûtî şûna ku bêjin ka em ji qûderê xisarê vegerin başe. Heta niha jî li pey komployên nû digerin. Weke destpêkê me diyar kir, taybetmendiyên dewletan de hemû cûre derew û xapandin hene, ji bo berjewendiyên xwe ger pêwîst kir di şevekê de dost dibin dijmin, dijmin dibin dost. Her du dewletên ku hember demokratîkbûnê berxwedan û ji bo gaveke hêsan jî demokratîk neavêjin jiyana milyonan mirov tûne kirin, bi yek emrek ji Rûsya hat, wezîrê wan bi rê ket û hatin cem hev rûniştin. Li gor gotinê wan demekî nêzde jî serokê van dewletan werin cem hev rûnin. Bi qasî ku berjewendiyên xwe difikirin nîvê wê berjewendiyê gelê xwe bifikirî ba niha çi pirsgirêk nemabû. Dema berjewendiyê wan her du desthilatdaran bû mijara nîqaşê, dewleta dagirker ya Tirkiyê ew komên bi salane perwerde dikirin û qaşo dixwast wan weke bedîlê hikûmeta Sûrîyê amade bike, di şevekê de dev ji wan berda û bi gotina``Mûxalefetê Sûrî divê pirsgirêkên xwe bi rêjîma Sûrî re çareser bikin`` wan firot.

Rêjîma Sûriyê jî, rûxmî ku dema herî zehmet de ji ber dijminayî ya Sûriyê nekirin, bi çeteyên Artêşa Azad re nebûn yek û hember Sûriyê şer nekirin bûn hedefê dewleta dagirker ya Tirkiyê, vê rastiyê ji bîr kir û careke din ji bo berjewendiyê xwe yê kesayetî û bi encamê zextên Rûsya qebûl kir ku bi dewleta dagirker ya Tirkiyê re hevdîtinan bike.

Ev her du dewletên paşverû û berjewendîperest niha jî hewl didin ji bo desthilata xwe bidomînin cardin hember Kurdan komployek nû pêş bixin. Her yek ji van dewletan rojek bê hesabê hemû kiryarên xwe bidin lê rolê xirabker û dijminane ya Rûsya jî ewê ti car neyê ji bîr kirin.

FENER

## Tirkiyê Derewa Mezin A Li Rojhilata Navîn E



Idrîs HENAN

Xuyaye civîna herdu wezîrên parastinê yên faşîzma Tirk û rejîma Şamê li Rûsyayê, çeteyên ku hêkên xwe di selika Tirkiyê de kirine bi panîkê xistiye û şevpesta lihevkirina herdu rejîman dijîn. Tirsa wan a bingehîn ew e ku bibin qurbanê berjewendiya Tirkiyê bi rejîma Sûriyê re û Erdogan stûyê wan radestî werîsa sîdara Şamê bike.

Piştî ku hinek bertekên xwe li vir û li wir nîşan dan, berpirsên faşîzma Tirk diyar kirin ku tenê Tirkiyê siyaseta xwe destnîşan dike. Yanê bertekên li herêmên dagirkirî li bakurê Sûriyê derketine, paşguh dike û bi fermî jî jê re dibêje; hindek çeteyên me afirnadine nikarin bandorê li siyaseta me bikin.

Diyar e ew kesên deh sal in zêdetir îdîa dikin ku qaşo rikber û muxalefet in, tenê ezbeniyên ber deriyê faşîzma Tirk in. Xwefiroş û leşkerên bêpere yên bermahiyên sultanê nexweş in. Fena miriyê kevir li serî ketiye li wan hatiye û tevî hemû hişyariyan, naxwazin bi vê yekê îqna bibin. Ji ber ku di rehmê kurtêlxwariyê de hatine tîmarkirin, heya vê kêliyê jî bawer nakin ku metodekî kirêt û qirêj in ku bi destê wan tabloya civakî ya pirrengiya gelên Sûriyê hatiye reşkirin.

Helwest û nêzîkatiyên faşîzma Tirk, keda Rûsya, lihevkirinên bêdeng ên li başûrê Sûriyê û tiyatroya serçeteyê Alqayîde li Idlibê – Alcolanî, baş dirêsîne ka rewşa kesên vîna tayînkirina qedera xwe ji dest dane wê çi be? Pêşketin û daxuyaniyên kêlî bi kêlî yên hikûmeta AKP ku li ber ezmûna dawîn a hilbijartinan e, gelek eşkere destnîşan dike ku Erdogan ji bo parastina desthilata xwe û bidestxistina serketinek dîplomasî berî hilbijartinan, çi kiriye jî wê bike. Ji bona wê jî amade ye her tiştî bixe mijara bazarê ku kaxeza Sûriyê yek ji kaxezên bingehîn ên bi salan e li ser dilîze ye.

Qirecirên vir û wir jî bê mane û bê tesîr in. Aliyek li gorî pîvan û prensîbên ecîndeyên derneteweyî hatibe şuxlandin, bêguman, qet ne gengaz e ku xwedî vîn be. Di eslê xwe de, hebûnek çelûxwar ê li gorî daxwaz û berjewendiyan hatiye kedîkirin e. Lewre jî, çendîn qîr bikin û dixwaza zengilokê jî biçirînin, kesek wan nabîne û ne jî dengê wan tê bihîstin.

Kesên bi salan di bin silogana Tirkiyê ya ku parastina ewlehiya neteweyî de, li dijî gelên xwe şer dikirin û li rex desthilatê bûne sebeba mirina bi sedhezarên gelên Sûriyê, îro bi rastiya xwe re rû bi rû ne. Dewleta Tirk ji bo tunekirina Kurdan, doza wan û berfirehkirina dagirkeriya xwe li herêmê, piştgiriya van girûbên xwefiroş kiriye û komên terorîst ên weke DAIŞ'ê û Alnusra hewandine û li dijî projeya çareserker bi rê ve birine. Di bin navê parastina gelê Sûriyê de, kînên xwe bi Kurdan re safî dikirin. Îro jî, piştî civîna li Rûsyayê, isbat bû ku Tirkiyê di oxira dijîtiya Kurdan de, hazir e her tiştî bike. Çi tişta heya roja îro jî hatiye gotin, derewek mezin û xeyalên donkîşot in. Ji xwe derewa mezin a li herêma Rojhilata Navîn, Tirkiyê û komara wê ya li ser temenê diziyê hatiye avakirin e. Bêkokî nikare xwedî li reseniyê bike. Tenê bêkok bi bêkokan re dikarin li hev bikin. Têgihaştin têra mirovê biaqil dike ku zanibe ka projeya kê li Sûriyê domdar û bi ser ketiye!